


# PDK-BAKUR

## BERNAME

## Pêvajoya Dîrokî ya ku partiya me PDK-Bakur anî holê

Kurdistan welatekî ji alî dagirkeran ve hatiye dagirkirin û di bin nîzama mêtingeriyê de ye. Parçeyê Bakurê welatê me, di dema Mahmûdê II. de, di encama polîtîkaya "Navendîkirinê" ya Împaratoriya Osmanî de, statuya xwe ta xweseriyê wenda kir. Piştre jî, pêvajoya ku bi Sevr, Lozan û Peymana Mûsilê dest pê kir, bi çarparçebûna welatê me encam da.

Her çendî Kurdistaniyan li dijî pêvajoya parçekirin û dagîrkirina Kurdistanê, li Başûr bi bizava Berzencî û Barzanî, li Bakur bi Qoçgîrî, Tevgera Azadî, Xoybûn û Berxwedana Dêrsimê li ber xwe dan jî, bi sedema kêmaniyên wan bizavan û ji ber piştgiriya zilhêzên desthilatdar yên cîhanê ji bo dewletên dagirker, parçebûna Kurdistanê teqez bû.

Dewleta dagirker ya Turkiyê, di wê demê de, li welatê me komkujiyan kir, bi sedhezaran kes ji Kurdistanê bi dûr xist û projeyên bişaftinê û tunekirinê bi kar anî. Bi taybetî di bernameyên wek "Plana Serrastkirina Rojhilat", û herweha di raporên ku di demên cûrbecûr de ji aliyê Pişkînerê Giştî (Waliyên Dagiriyê) ve hatine nivîsandin de eşekere dibe ku çawa li hemberî gelê me

kiryarên ji mirovahiyê dûr hatine kirin.

Dewleta Dagirker di gel komkujiyan, bi qedexekirina zimanê me û cilû-bergên me, çanda me jî talan kir, ji xwe re kir mal û bi vî awayî polîtîkayeke jenosîdê ya dûmdirêj bi rêve bir.

Dewleta Dagirker ji bona di vê polîtîkaya xwe ya hovane de bi serkeve, bi projeyeke bipêşxistî Bakurê Kurdistanê bi nave "Rojhilatê Ferat" û "Rojavayê Ferat" ji hev veqetand. Di gel li Rojhilatê Ferat komkujî û cîhêlî pêkdihanî, pêşekî dida ku li Rojavayê Ferat bi cînişên ji derveyî Kurdistanê dagire û bi vê yekê xwestiye ku demografiya Kurdistanê têk bibe, û cudahiyên olî yên di nava gelê me de, ji bo siyaseta xwe ya "Tirkkirinê" de wekî amrazek bi kar bîne.

Her wekî belgeyên di vê dema nêzîk de dide xuyakirin; ev cure polîtîka ji layê Cûntaya 1960î ve jî hatine nûjenkirin û birêvebirin. Li bajarên me yên wek Elezîz, Meletî, Mereş û Erzînganê, pevçûnên çepgir û faşîstan yek ji encamên vê plangêriyê bûn. Bi gûrkirina nakokiya Alewî-Sunnîtiyê, kurdên Alewî ber bi rêxistinên çepgir yên Turk ve hatin handan, Kurdên Sunnî jî ber bi partî û rêxistinên sîstema dagirker ve hatin meşandin. Her du beş jî ji hizr û bîrên netewetiyê hatin bidûrxistin û gelek ji wan ber bi tirkbûyînê ve çûn.

Wê demê rêxistinên bakurî li hemberî vê yekê tu pêngav bi pêş nexistin, lewra dijmin li beşekî welatê me di siyaseya bişaftinê de bi ser ket.

Piştî berxwedana Dêrsimê ya 1938an, li Bakurê Kurdistanê têkoşÎna azadîxwaz rawestiya, liberrabûnên deverî bi dawî hat û bi navê rêxistiniya Kurdistanê tu bizav li holê nema.

Piştî Serokê nemir di 1958an de vegeriya Başûrê Kurdistanê û di destûra nuh ya Iraqê de Kurd weke netewe hatin naskirin, li Bakur ji nuh ve tevlivandinekê dest pê kir. Dewleta dagirker wan rûdanan zû dît û bi binçavkirinên ku bi navê 49an tê zanîn, dest bi girtinan kir. Di pey re, ji bona rêlibergirtina birêxistinbûna Kurdistanê, bi destêwerdana desthilatdariya leşkerî, ew bişaftina bi "dizî" ya navbuhurî û planên înkarkirinê ji nuh ve xistin holê û asta zordariya fizîkî zêde kirin.

Di salên 1960an de hinek rûdanan hêştin ku gelê Kurdistanê ji aliyê têgihîştina polîtîk ve ber bi pêş ve biçe. Yek ji wanan; mafê çarenûsiya gelan, bi bendên 1emîn û 55emîn yên Peymana Netewên Yekbûyî (NY) hat naskirin. Herweha, naverok û çawayiya bikaranîna vî mafê bi du peymanên din yên NY ve hatin pesendkirin. Yek ji van peymanan bi navê Peymana Navnetewî ya Abori, Civakî û Çandî ye, û yan din jî Peymana Navnetewî ya Mafên Şaris-

tanî û Siyasî ye, ku ev herdu peyman di nav gel de wekî peymanên cêwî tên zanîn. Dîsa ji rûdanên pratîkî mirov têdigihêje ku bergeha vî mafî dê hertim berfirehtir bibe. Di serdema ji 1946an heta salên 1960an, gelek welatên mêtingeh û madayên li Asya û Afrikayê serbixwe bûn.

Ya din; li seranserê cîhanê tevgerên bi pêşevaniya ciwanan dest pê kirin. Wê pêla ku li ser bingeha azadiyê bilind dibû, bandorê li gelê me jî kir. Ya sêyem û ya herî girîng jî; destpêkirina Şoreşa Îlonê bû, ku piştî vegera Mele Mustafayê nemir ya Başûrê Kurdistanê, bi pêşevaniya PDK (Partiya Demokrata Kurdistanê) dest pê kir, ji ber ku eşekere bû ku rêveberiya ereb ya dagirker û nîjadperest ji soz-peyamên xwe û helwesta xwe ya domandina dagirkeriyê dike.

Van rûdanên hanê ji pêşevanê me yê dilêr Seîd Elçî re zemînek afirandin ji bo destpêkirina xebata damezrandina partiyeke niştîmanî li Bakurê Kurdistanê. Partiya yekem ya li Bakurê Kurdistanê, partiya me, bi navê PDKT, ji aliyê pênc damezrênerên me ve, di 1965 de, li paytexa me ya paşerojê, li Diyarbekirê hate damezrandin. Li gora wê demê, PDKT xwedî bernameyeke gelek pêşverû bû û ji xwe re kiribû armanc ku parçeyê bakurê welatê me azad bike û lê bibe deshilatdar.

Partiya me, di kongreya xwe ya 4emîn de, ku di 1991 de hat li dar xistin, navê xwe guhart û kir PDK; di kongreya 5emîn ya di 1992an de PDK-Hevgirtin; û di kongreya xwe ya 6emîn ya di 1994an de navê xwe kir Partiya Demokrata Kurdistan-Bakur (PDK-Bakur), ku bi vî navî jî partiya me ya yasayî îro hetiye damezrandin. Bi vê ve girêdayî; partiya me, berdewamiya rewa ya PDKTê ye ku di 1965an de hatiye damezrandin.

**Rewşa Gelê Kurdistanê**

Gelê Kurdistanê îro li welatê xwe ne azad e, û ji aliyê siyasî, aborî, civakî û derûnî ve perîşan e. Bi her awayî eşkere ye ku aboriya mêtingeriyê li Kurdistanê tê birêvebirin. Ked, madeyên xam, enerjî û sermiyan ji Bakurê Kurdistanê bo welatê mêtingeran têne veguhestin, û gelê Kurdistanê nikare ji dewlemendiyên xwe yên serzemîn û jêrzemînê sûdê wergire. Di gel vê yekê, pêkanîna rêbaza aboriya mêtingeriyê jiyana Kurdistaniyan jî dixe metirsiyê. Wek mînak, her sal bi mîlyonan Kurdistaniyên ji her temenî, ji bo li welatê mêtingeran bi pereyek bêxêr di zeviyên çandiniyê de bixebitin, li ser pişta kamyonan bi rêyan dikevin û di encama qezayên trafikê de jiyana xwe ji dest didin. Kurdistaniyên ku ji alîyê mêtingeran ve li metropolan wekî keda erzan û karkerên bînasaziyê tên xebitandin, ji ber ku di navbera xwe de bi zimanê xwe dipeyivin, rastî erîşên lînckirinê tên û jiyana xwe ji dest didin. Mînakek din jî ew e ku, Termîk Sentrala ku ji alîyê mêtingeran ve li bajarê Silopîyê

hatiye damezrandin, jiyana gelê Kurdistanê dixe nav metirsiyê, û ne ji bona pêdivîya Gelê Kurdistanê, lê belê ji bo pêdivîya enerjiya otêlên pêncstêr yên Antalyayê kar dike.

Li gora lêkolînên hatine kirin, Bakurê Kurdistanê, ku koloniyeke dagirkirî ye û sîstema aboriya kolonyalîzmê li wê serdest e, beranberî gelê Tirk zêde hejartir e û ji lêçûnên perwerdeyî û laşsaxiyê kêmtir sûdê werdigire. Li gora lêkolînên saziyên fermî yên dewleta mêtinger; dema serê kesê dahat diyar tê kirin, bîstûyek bajarên Kurdistanê bajarên herî hejar in.

Dewleta Mêtinger bi bahaneya pevçûnên bi PKKê re, di xwezaya Bakurê Kurdistanê de rûxandinên mezîn daye peydakirin. Mêtingerên ku li welatê xwe bi kampanyayên çandiniya darûberan avadaniyê dike, xuya ye sond xwariye ku yek darekê li Kurdistanê nehêle. Daristanên li welatê me, bi destên hêzen leşkerî, bi awayekî sîstematîk têne şewitandin û tunekirin. Bi vî awayî jiyana xwezayî ya li Kurdistanê bi xetera tunebûnê re rûbirû hatiye hiştin.

Zaravayê Dimilkî yê Kurdî, ji alî YN ve ketiye nav zimanên ku berî li wendabûnê ne. Zaravayên Kurdî, Kurmancî û Dimilkî, wek zimanê perwerdeyiyê nayên bi kar anîn, û dibistanên taybet yên ku ji bo xapandinê destûr hat dayîn jî, kilît li dergehên wan tên xistin. Ev yek jî diyar dike ku mêtinger

dixwaze zimanê Kurdî ji jiyana Kurdistaniyan derbixîne û gelê me bibişêve, asîmîle bike.

Mêtinger, bi destê Serkirdeyatiya Karûbarê Diyanetê, sererast destê xwe dirêjî azadiya ol û baweriyê ya Kurdistaniyan dike. Li şûna Alewîtiya Kurdistane û Şafîîtiyê, ku du baweriyên herî belav in di nav gelê me de, baweriya Alewîtîya Tirk û Hanefîtiyê li ser gelê me tê spartin. Bi rêka vê destdirêjahiya li ser baweriyên Kurdistaniyan, dixwazin bişaftinê bileztir bikin.

Jinên Kurdistanê di jiyana civatî û xebatê de gelek kêm cih peyda dikin. Ev rewş, encama xwezayî ya aboriya mêtingeriyê ye. Bi vê yekê, bi rêka jinên me, tê xwestin ku jiyana Kurdistanê ya kevneşopî (gerdişî) perçe dibe û li şûna wê şêwazeke jiyanê ya bêserûber bête bicîhkirin.

Ev bêserûberiya ku encama statuya dagirkeriya mêtingeran e, bitenê bi azadbûyina Kurdistaniyan û avakirina dewleta xwe dikare bête serrastkirin.

**Regezên Partiya me**

Partiya me şopgirê Ehmedê Xanî, Ubêydullahê Nehrî û ramanên siyasî yên Mele Mustefa Berzaniyê nemir û ya dîroka têkoşîna rizgariya Kurdistanê ye.

Partiya me, partiyeke neteweyî-şoreşger e, û bi mercê pabendiya rêbaza Partiyê, birêxistinkirina hemî raman, etnîsîte, ol, mezheb û hemî çîn û pileyên civata Kurdistaniyan ji xwe kiriye armanc.

PDK-Bakur partiyeke girseyî ye. Partiyeke ku rêbaza netewekariyê pejirandibe, nabe partiyeke mîsyonî yan jî partiyeke kadiran. Lewra, partiyên neteweyî ku têkoşîna rizgariyê dikin, armanca wan ya yekem civatê li dora projeya xwe bicivîne û tevaya gel ber bi rizgariyê ve bide meşandin. Di vê rewşê de tişta diyarker, baweriya ji bindestiyê rizgar bûn û pabendbûna projeya sîyasî ye.

PDK-Bakur di karûbarê xwe yên navxweyî de, li ser bingeha hêmanên demokratîk, pirdengî û dîsîplînê tevdigere.

Partiya me netewekariyeke li ser bingeha regezperestiyê red dike; neteweyekariya li ser bingeha erdnîgariyê (welat) dipejirîne. Bîrûbaweriya netewekariyê ya Partiya me, xwe dispêre desthilatdariya gelê me ya li ser axa xwe, ango projeya dewletbûyinê.

Kesayetiyên  ji baweriyên polîtîk yên cûrbecûr di nav Partiya me de dikarin cih bigirin, lêbelê ev rewş nabe tu caran ziyanê bigihîne xeta Partiya me. Tu kes nikare baweriyên xwe yên polîtîk di ser netewekariya Kurdistanê re

bigire.

Kurdistan ne welatê Kurdan bi tenê ye; ya hemî rûniştevanên Kurdistanê ye. Di warê ziman û baweriyên olî de, Kurdistanî ne xwerû ne. Li welatê me hemî baweriyên olî, herweha hemî mezheb, ziman û zarava divê hebûna xwe biparêzin û bêne bipêşxistin. Partiya me xwe wekî Kurdistanî dide nasîn û lewra di xebata rizgariya welatê me de, ji bona hemî beşên civakî beşdarî tekoşînê bibin dixebite; û piştî rizgarbûnê jî, dê hewl bide da ku taybetiyên olî û çandî yên civaka me geş bibin.

Em dibînin ku hin aliyên ku me nas nakin, Partiya me wek partiyeke parêzkar (muhafazakar) bi nav dikin. Ji ber ku hemî gelên di nav têkoşîna rizgariyê de û partiyên wan yên netewekar di warê çand, ziman û baweriya olî û hêjayiyên kevneşopî de xwedî hestyariyê ne, ev yek dibe sedemê binavkirineke weha. Ev helwesta hestyar, pêdiviya projeya neteweyî ye; yan na, têgihiştineka ku jiyana xwe ya çandî ji talankirina dagirkeriyê re vekirî bihêle, nikare xwe wekî neteweperwer bi nav bike. Kes û aliyên dikevin nav vê şaşîtiyê, ew in ku parêzkariya çandê û parêzkariya polîtîkî tevlihev dikin. PDK-Bakur bi wateya siyasî de partiyeke şoreşger e. Lewra ew, bi rêya parastina pêkhatina çandî ya civakê, rê li ber siyaseta tunekirinê ya dagirkeran digire, û bi rêya hilweşandina statukoya zordariyê jî, armanca desthilatdariya li welatê xwe

dide ber xwe.

Partiya me, desthilatdariya huqûqa gerdûnî, mafên mirovan, û mafên neteweyên kêmjimar, ku bermayên mirovayiyê ne û ji aliyê cîhana hevdem ve têne pejirandin, diparêze. Pirdengî û pirrengiya siyasî û civakî ji xwe re dike bingeh. Di vê çarçoveyê de, tucar çênabe ku partiya me dijminatiya dîtin û ramanên siyasî yên Kurdistaniyan û rêxistinên wan bike. Ji bona deshilatdariya siyasî şerê kurdkujiyê, ji aliyê PDK-Bakur ve, xwekujî ye û wêrankirina welatê me ye.

Partiya me, Mustefa Berzanî wek serokê bîrûrayê xwe dipejirîne û kiryar û tevgerên Wî yên şorşgerî wekî rêbaza xwe dibîne.

**Armanca Partiya me**

Weke hemû gelên cîhanê, Kurdistanî jî xwedî mafe xwebirêxistinê yê di asta neteweyî de, ango avakirina dewleta xwe ya neteweyî ne. Dewleta mêtinger, ji bona rê li ber mafê huqûqî yê dewletbûyina gelê me bigire, di gel siyaseta înkar û tunekirinê, hin tevgerên bi navê Kurdistanî tevdigerin di nav de, tevaya rê û rêbazên nelirê bi kar tîne û bi vî awayî dixwaze hêviyên gelê me bi dawî bîne. Partiya me tam di vê demê de, dê hêvîya azadiyê pêl bi pêl bi rê bixe û derûniya têkçunê û bêhêvîtiyê ji hev belav bike.

Dewleta mêtinger hemî dewlemendiyên welatê me dimije; ked, madeyên xam, sermiyan û enerjiyê ji Kurdistanê digire û ji bo navenda xwe veduguhêze. Partiya me, bi dawîlêanîna têkiliyên mêtingeriyê, û bi desthilatdariya Kurdistaniyan ya li ser welatê xwe, dê bihêle ku hem hilberîna aborî û hem jî derbirîna bîrûrayê azad bibe. Bi vê yekê, veguherîn û pêşketina civakî dê pêk were. Pêşniyarên berew parastina statukoya mêtingehiyê ya li Kurdistanê dijî şoreşgeriyê ne. Lewra, berdewamiya statuya mêtingerî û dagirkeriyê, pêşî li ber pêşketinê û azadiya civakî digire. Piştî azadbuyina welatê me Bakurê Kurdistanê, Partiya me dê "Kongreya Rizgariyê" bicivîne û dê bernameya xwe ya aboriyê diyar bike. Divê em bibêjin, ku ev bername di her rewşê de, dê helwesta Partiya me ya kedparêziyê nîşan bide.

Li Rojavayê cîhanê, neteweparêzî bi nûjenparêziyê re peyda buye. Di dema şêwaza hilberîna li ser bingehê feodalîzmê, ku dewletê rewayiya xwe ji Yezdan û ji nûnerê Wî Qeral werdigirt, di şêwaza hilberîna sermiyandarî de jêdera rewayiya dewletê netewe ye. Bi xêra şêwaza netewe-dewletê, li Ewrupayê dawî li împaratorî û qeraliyetan hat û her neteweyekê, piştî pevçûnan, sînorên netewe-dewletên xwe bi rehetî destnîşan kirin. Di dema destpêkî

ya emperyalîzmê de, ji welatên dagirkirî re, piştî şerê parvekirina Cîhanê yê duyem, bi formulasyona bi navê Self-Determinasyonê (mafê çarenûsî), rêya avakirina netewe-dewletê hate vekirin. Mafê çarenûsiyê, bi Peymana NYyê û bi peymanên paşê yên NYyê ve hatiye pejirandin. Bi taybetî ji salên heftêyan pê ve, mafê Self-Determinasyonê, ji aliyê neteweyên ne di statuya metingehiyê û mandatiyê de jî hate bikaranînê. Wek numûne: Tîmora Rojava, Erître û Kosova bi vê rêyê bûne dewlet. Mafên Saharaya Rojava û Osetiya Başûr jî bi vê rêyê hatine pejirandin û dewletbûyina wan tê payîn. Wekî din, welatên wek Quebec û Îskoçya jî vî mafê xwe bi kar anîn, lê ji ber bijartinên xwe, heta nuha xwe serbixwe nekirine, nebûne dewlet. Çarçoveya vî mafî gelek berfireh bûye. Bingeha huqûqî ua serbixwebûna Bakurê Kurdistanê dê bikaranîna vî mafî be. Li gora rêgeza Huqûqa Navneteweyî, mercên bikaranîna vî mafî vanan in: Ji aliyê gelek ku (1) li welatekî sînorên wî diyar, (2) bi zêdejimarî dijî û bi têkiliyên derûnî û dîrokî, bi wî welatî ve girêdayî ye (3) Self-Determinasyona xwe radigihîne. Ji bona bikaranîna vî mafî, herdu mercên serî hene, lê mercê dawîn hê tune ye.

Birêxistinkirin û diyarkirina îradeya gelê me peyrewa Partiya me ye. Par-

tiya me dê rêzê li encamê dengdana bikaranîna mafê çarenûsiya Kurdistaniyan bigire. Lêbelê, ji ber xeta xwe ya neteweyî-şoreşger, di qada navneteweyî de, ango di rewşeke rewa de, di pêvajoya plebîsîtê de li gel serbixwebûnê helwestê werdigire û di vî warî de kampanya dimeşîne.


PARTIYA DEMOKRATA KURDISTAN-BAKUR
PDK
Bakur
1965